

PIŞTEVANÎYA ÇANDÊ

Kurmancî

Desteya çandê a Göteborg dibêje pêwîste jîyana çandî ya bajêr piralî û ji misteweya bilind be. Lewma piştewanîya aborî heye ji bo çalakîyên ji rengê pişesazî û siyaseta çandê. Ew proje û çalakîyên ku li bajêr û berê xwe didin xelkê li bajêr wê ji Desteya Çandê a bajêr bikaribin pere wergirin.

Projeyên pişesazî, peşengeh û berpêşkirin, konser an festîwal dikarin pere wergirin. Pîşekar dikarin her wiha bûrs an desteka ji bo kargeha hunerî jî bistînin. Ji bo nîvîskaran bûrsên taybet hene.

Bi Swêdî ahagî û qeîdeyên din hene di warê hemî cûre piştewanîya çandê de li ser www.goteborg.se/kulturstod

Serlêdan li ser malperê bi rengê servîsa înternetê dibe. Her wiha gengaze ku pirs û pirsîyariyên xwe bi zimanê Swêdî û Ingîlîzî bi rîya nameya înternetî bişeynin. Navnîşana nameyên înternetî eve: kulturstod@kultur.goteborg.se

www.facebook.com/goteborgkulturstod

Kulturstöd, Göteborgs Stads kulturförvaltning, Östra Hamngatan 16, 411 09 Göteborg

Piştewanîya çalakîyan

Piştewanîya bi vî rengî ji bo komên azad û çalakîyên çandê yên rûniştî derbas dibe. Piştewanîya ku tê dayîn ji bo 3 salan e.

Ewên ku vê cûre destek werdigrin di nav çada pişesazîyê de û bi demên dîr û dirêj dixebitin. Pêwîste xebata wan bi qelîteya bilind be û li gor daxwaz û hêviyên kesên ku bi pişeya wan re eleqeder be. Her wiha ew piştewanî tê dayîn ji bo çalakîyên ku siyaseta çandî dihewînin û ji bo bajarê Göteborg hêjan e.

Mercên di vî warî de evin:

Ew cûre destek tê dayîn ji bo pişesazên hoste û çalakîyên ku weke navenden derametî tevdigerin. Çalakîyên bi vî rengî pêwîstin ji bo salakê bin.

Piştewanîya Projeyan

Nîrxa Piştewanîya proje ne nîrxeka neguhêre û di salê de du caran tê dayîn.

Ji bo Projeyên ji rengê pişeyî û siyaseta çandî liGöteborg serlêdanê bike.

Mercên wê:

Bo afirandina berhemeka pişeyî ku jê re plansazî divê serlêdan dibe, amedakarî û pêşkeşkirina karekî ku ji xelkê re tê lidarxistin wek mînak pêşengeh, berpêşkirin an jî konsêrek li Göteborg. Lê divê projeyên wiha di demeka destnîşankirî de destpêbikin û bi dawî werin.

Tenê rêxistin dikarin piştewaniya bi vî rengî wergirin. Bi gotina rêxistin em dixwazin komeleyên netîcarî, komeleyên tîcarî, firmayên kesî an jî şîrket.

Piştewaniya proje Pronto

Piştewaniya projeyî ya bi navê Pronto salê çar caran tê dayîn û nirxa wê herî zêde 40 000 kron tê dayîn serê proje.

Ew cûre piştewani ji bo çalakîyên pişeyî û demkin ku li bajarê Göteborg li dar dikevin tê dayîn.

Mercên wê:

Piştewaniya di vî warî de ji bo afirandina berhemeka çandî di gel amedkarîyên wê tê dayîn. Pêwîste ew çalakî di heman demê de berê xwe bide xelkê, plansazîya wê hebe weke mînak pêşengehek, berpêşkirinek an jî konserek bê dayîn li bajarê Göteborg. Her wiha ew çalakî pêwîste di demeke destnîşankirî de detpêbike û bi dawî were.

Tenê rêxistinên netîcarî, yê tîcarî, firmayên kesî an şîrket dikarin wergirin ew cûre piştewani.

Alîkariya pêşveçûnê

Alîkariya pêşveçûnê reqemeke diyarkirî nîne û salê carek an jî du caran belav dibe.

Serî li alîkariya pêşveçûnê bide ji bo projeyên ku pêşvebirina xebatên çandî û hunerî ji xwe re kirine armanc û guhêrînên bingêhîn û bi çak û başiyê re eleqeder.

Şertûmerc:

Alîkarî ji bo hemî şêwazên gotin û derbirînê tê dayîn; weke mînak baldariya li ser pêşxistina rêbazan, şikl û pîvan, stratejî, pêşdebirina jîrbûn û qîretê, fikr û raman û xebatên weke wan.

Alîkariya pêşveçûnê ji rêveberiyê re tê raber kirin û ji bo pêşkeşkirina ji temaşevanan re çî şertûmercan nade pêş.

Tenê rêxistin dikarin alîkariya wekhevkirinê bistînin. Rêxistina di vir de me armanc pê kirî komeleyên nebazirgan, weqif, şîrketên şexsî û şîrketên asayî ne.

Piştewaniya kargehên hunerî

Piştewaniya kargehên hunerî salê carek tê dayîn. Pereyên tînan dayîn di nava serlêderan de tê parve kirin.

Ji bo kîrêya kargeha hunerî dikarî piştewani bistîni ku tu tê de karê pişesazîya profesyonel dikî li Göteborg.

Mercên wê:

Serlêder pêwîste herî kêr sê salan perwerdeya pişesazî, kardestîya pişeyî an jî wêne ya bilind xwendibe. her wiha lazim e serlêder ew perwerdeya xwe qedandibe sê salan berî serlêdana wergirtina piştewaniyê. Dîsa ger te tecrube hebe di heman mijarê de ji sê salan zêdetir dikarî serî lêbidî ji bo destekê lê hîngê pêwîste te dokument hebe ku te kar kirîye an jî pêşengehên te li darketine. Ev cûre piştewani şexsiye û bac jê tê birrîn.

Pereyên lezgîn (En snabb slant)

Ev cûre burs di navbera 2000 û 20 000 kronan de ye û dema serlêdanê dem demîye.

Ger emrê te di nava 18 sal û 25 salan de be û tu yê projeyeka çandî li dar bixî ji bo xelkê Göteborg.

Mercên serlêdanê:

Pêwîste tu li ser nifûsa Göteborg bi qeyd bî. Salên te di navbera 18 û 25 de ye. Serlêdan ger mehekê pêşîya projeya çandî li darkeve were kirin û çalakîya çandî lazim e li hember xelkê bê berpêşkirin.

Hun dikarin bi me re têkîlî deynîn da ku nîqaş bikin bê ka derfetên ji bo projeya te çin e.

Bûrsa nivîskaran

Nivîskar dikarin bûrsa taybet wergirin ji desteya çande ya şaredariya Göteborg. Nirxa wê bûrsê 50 000 krone.

Ger tu bi swêdî romana, çîrokan drama û lîrîkan binivîsî an jî her wiha rêzenivîsan binivîsî an wergerîya wêjeya bedew bikî dikarî serî lêbidî ji bo wergirtina ewan bûrsan. Ger te di wan pênc salên dawî de herî kêrî yêk pirtûka ji cûreyê wêjeya bedew nivîsandîbe û weşandîbe an jî wergerîya pirtûkeka ji wêjeya bedew kirî be dikarî serî lêbidî ji bo wergirtina vê bûrsê.

Ji bo kesên ku berhemên şanoyî dinivîsîn ger te herî kêrî 2 berhem wergerandibin an jî nivîsandibin ku hatine pêşkeş kirin an jî weşandin di wan 5 salên dawî de.

Mercên wergirtinê:

Serlêder pêwîste li ser nifûsa Göteborg be û karê xwe li bajêr bimeşîne. Lazim e te xwendina pîşesazîyê kiribe an jî ew kara bi profesyonelî kirîye herî kêrî 3 salan. Çalakîya pîşewanîyê ya bi belge tê wê wateyê ku te bi peyman li cîhekî kar kirîye û di hîn çalakîyên çandî de nûnêrtîya te hatîye kirin.

Bûrsên Çandî

Şaredariya Göteborgê her sal bûrsên çandî belav dike ku nirxên ewan ji 30 000 krone.

Serî lêbide ji bo wergirtina bûrsê ger te feyde da be jîyana çandî ya Göteborg e.

Mercên wergirtinê:

Serlêdar pêwîste li ser nifûsa Göteborg be û her wiha karê xwe yê çandî li bajêr bimeşîne. Lazim e te xwendina pîşesazîyê kiribe an jî ew kara bi profesyonelî kirîye herî kêrî 3 salan. Çalakîya pîşewanîyê ya bi belge tê wê wateyê ku te bi peyman li cîhekî kar kirîye di hîn çalakîyan de nûnêrtîya te hatîye kirin.

Alîkariya wekhevkirina çandî ya ji bo zarok û cîwanan

Serlêdana alîkariya wekhevkirinê bê navber bi dirêjîya hemî salê dikare bê kirin û divê ji bo armanca berhemkarî an jî karê di cîh de (100 kron serê zarokê serlêdan kirî ku hîngê divê bilêt herî kêrî ji bo 40 kronî hatibe firotin) an jî bi qasî nivê nirxa berhema hatî firotinê be.

Serî li vê alîkariyê bide ji bo karê hunerî, çêkirina karên ji bo pêşengehî li bajarê Göteborgs (ango di nav şaredariyê de) ku zarok û cîwanên di navbera salên 0–19 de ji xwe re kirine armanc.

şertûmerc:

Serlêdan dikare bê kirin ji bo saloxdana berhemeke amadebûyî an jî ji bo kar û xebatekê.

Tenê rêxistin dikarin alîkariya wekhevkinê bistînin. Rêxistina di vir de ku me armanc pê kirî komeleyên nebazirgan, weqif, şîrketên şexsî û şîrketên asayî ne.